

246_Tietoa karanteenipäätöksen saaneelle
[kurdi(kurmandzi)]

Agahdarî ji bo kesên ku karantîne bûne

Em dizanin ku hûn bi kesek ku tûşî nexweşiya COVID-19 bûye re re rû bi rû bûne, û ji ber vê yekê ji we re pêşniyar hatiye kirin ku hûn di karantîneyê de bin. Karantîne tê wateyê ku azadiya tevgera kesek saxlem hatiye asteng kirin. Karantîne tête bikar anîn da ku pêşî ji belavbûna vîrûsê ji aliyê kesek tûşîbûyê bêt nîşane ji kesen din re bête girtin. Biryara karantîne yê li ser bingeha Qanûna Nexweşiyên Giştgir e.

Maweya karantîneyê

Maweya karantîneyê di dema karantîneyê de tête destnîşan kirin. Maweya karantîneyê bi giştî 10 roj ji rûbirûbûna paşîn de ye. Maweya karantîneyê di rewşên ku ji kesek zêdetir di heman malê de dimînine, du hefte ne. Maweya ji destpêka nîşanan an jî, di rewşa kesek bêt nîşanan de, ji roja radestkirina nimûneyê destpê dike.

Mebesta karantîneyê di pratîkê de çiyê?

Di dema ku hûn karantîne ne, divê hûn têtikiliya bi kesên li derveyî malê re dûr bibin. Pêdivî ye ku hûn maweya karantîneyê li malê derbas bikin. Eger hûn nêzî kesên din nebin, hûn dikarin derkevin derve. Gengaze hûn neçin bin ku neçin cihê kar, dibistan, baxçeyê zarokan, firoşgeh an dermanxanê, ji ber ku pêşîlêgirtin ji têtikiliyek nêzîk di cihên wisa de pir dijwar e. Gengaze hûn tu mêvanan nebînin û pêwîste ku xwarin li malê radestî we bibe.

Heval û xizmên we yê ku têtikiliyek rasterast digel kesek tûşîbûyî re tune bûn, dikarin jiyaneke normal hebin. Ev tê wê wateyê ku berevajî kesek ku tê karantîne kirin, Pêwîst nîne ku heval û xizmên we bêne karantîne kirin. Kesên têtikildar bi kesek bê nîşanê di karantîneyê de, yê din tûşî vîrusa korona nakin.

Eger kesek nikaribe xwarin an derman ji we re radest bike, hûn dikarin ji jimareya 09 310 44400 re telefon bikin.

Nîşaneyên tûşîbûnê vîrusa korona

Maweya di navbera tûşîbûna û nîşanên yekem de 1–14 rojan e, bi giştî 5–6 an rojan e. Nîşaneyên asayiyên vîrusa korona pêk tên ji tayê, kuxikê, dilrabûn, zikçûn, êşa masûlkan, êşa qirikê, avrêjîna pozê pozgirtin, bêtengî û ji destdayina bêtengî û tamê.

246_Tietoa karanteenipäätöksen saaneelle
[kurdi(kurmandzi)]

Çawa ez dikarim testekê ji vîrusa korona re bidim?

Eger di dema karantîneyê de yek ji van nîşanên jorîn di leşê we de xûya bikin, tavî ku sivik bin jî, bilez herin testa vîrusa korona ji xwe bigirin. Hûn dikarin bi dagirtina Forma Nirxandina Nîşanên Vîrusa Korona-yê re li Omaolo.fi yan bi têkiliya bi hejmara telefona Xeta Alîkariya Vîrûsa Korona, 09 310 10024 (rojane ji saet 8:00–18:00) wextekî ji bo testa Vîrûsa Korona destnîşan bikin. Di rewşên awarte de, ji kerema xwe bi hejmara telefona alîkariya bijîşkî 116 117 re têkiliyê bikin.

Her weha eger zaroka/ê we hatibe karantîne kirin, em ê vê agahdariyê radestî we bikin. Sergêr her weha dikarin ji bo zarokên xwe yê bin 16 saliyê de bi rêya xizmetên Omaolo.fi an bi têkiliya bi Alîkariya Vîrûsa Korona re bi hejmara 09 310 10024 wextekî destnîşan bikin.

Qerebûya jidestdayina dahatê

Jidestdayina dahatê ji ber destûra karantîneyê tê bête qerebû kirin bi rêya alîkariya lêçûnên nexweşiyê ji ber nexweşiyên giştgir. Hûn dikarin ji bo standina vê serdana saziya Sîgorteya Civakî (Kela) bikin. Hûn biryarek karantîne yê ku ji aliyê Bijîjkê Nexweşiya tûşîbûnê yê Helsinki ve hatiye nivîsandin, ku divê bi daxwaza we re were girêdan, bistînin. Biryara karantîneyê dê jixweber wekî nameyek qeydkirî yan e-mailek ewle ji were tê bête şandin. Divê hûn daxwaza xwe di nav du mehan ji roja derçûna karantîneyê bidin Kela yê.

Alîkariya Nexweşiya Tûşîbûnê qerebûyek tame ji bo jidestçûna dahatê ji bo karnekirina ji ber karantîneyê ye. Alîkariya xercê rojane ya karmendan li gorî meaşê ku di kar îde distendin tê diyar kirin. Alîkariya lêçûnên karsazî tê li ser bingeha dahatiya ku salane bidest dîne û beşdariya sîgorteya YEL yan MYEL ya wan tê hesabandin. Sergêrên zarokek ku temenê wî/wê di bin 16 saliyê de ye, eger zarok were tecrîd kirin û sergêr nikaribe bixebite, tê alîkariya xercê nexweşiya tûşîbûnê hebe. Agahdariyên zêdetir li vir hene www.kela.fi/web/en/sickness-allowances-infectious-disease.

Karantîne bûna mecbûrî ye

Pêdivî ye ku hûn destûra karantîneyê ku ji aliyê rayedarek nexweşiyên giştgir derdiçe, bişopînin. Li gorî Qanûnên Fînlandiyayê, bînpêkirina biryara karantîneyê dikare wek tawana dijî parastina tenduristiyê bi cezayê aborî yan heya sê mehan zindan were cezakirin, her çend hûn kesek din jî nexweş nekin.

Ji bo kesên ku di karantînê de ne talîmatên bêtir li vir hene www.hel.fi/helsinki/coronavirus-en